NEWROZ

Îsa Tahir

Şev û roj, hevdij in; her wesa herdu yek in; eger yek nebe a din jî nabe. Ji roja hebûnê, hevrikiyeke dijwar di navbera wan de heye, her yek dixwaze pitir li esmanê însanan bimîne. Bi dirêjiya rojên salê, carna şev ji rojê dirêjtir e dibe carna roj. Di salê de, tenê du rojan, şev û roj wekhev in anku hindî yek in. Roja êkê roja (23)ê meha(9)û roja duwê, roja (21) ê meha (3) roja Newrozê, lê cidahiyek di navbera wan her du rojan de heye; Piştî roja 23 ê meha 9 êdî (şev) dirêj dibe û (roj) kurt dib, anku (şev) li ser (roj) ê zal dibe û serma û tariyatî zêde dibe; lê li roja 21ê meha 3 ê êdî (roj) dirêj dibe û serma lawaz dibe û bihar dest pê dike. şev ji bo mirovên berê pir zehmet bû, ji nexweşiya tariyê, xwe parastin ji giyanewerên dirinde, ji sermayê, bargiraniya peydakirina xwarinê… ji ber wê yekê(şev) li cem mirovan nîşana nebaşiyê bû, lê roj li cem mirovan, nîşana xêr û xweşiyê bû, ji ber ronahiya wê, germatiya wê, dikarî xwarinê peyda bike û xwe ji nemanê rizgar bike. Roja 21 ê meha 3 ê, destpêka kurtiya şevê ye

û nemana sermayê, destpêka xêrûxweşiyê ye, ji mişebûna gulûgiyan, avê û giyaneweran…Her di vê roja xêrê de, ji dîroka babûkalên me rûdaneka herî giring çê bû, ew çi rûdan bû?

Padîşahekê zordar hebû, navê wî Dehak yan jî Ejdehak bû. Hindek dibêjin, ramana navê Dehak anku, deh nexweşî, navê Ejdehak anku marê mezin û dirînde. Ewî padîşahî, wek efsane dibêje, du marên mezin li ser milên wî bûn, diviya her roj mejiyê du lawan dabanê û xwariban heta çendekê giyanê wî aram bûba. Babûkalên me, wek her car bi zilim û zoriyê razî nebûn, sere xwe hildan û Kawayê Asinger ji xwe re kirine pêşewa. Kawayê Asinger roja 21î meha 3 ê kire roja serhildanê û şiya bi hêza gelê xwe, Dehakê zalim bikuje û xortên kurdan ji nemanê rizgar bike. Kawayê Hesinger xwesta desthelatê nebû, ji ber wê yekê, demê Dehak kujtî, li şûna wî rûnenişt, belku Fireydûnê dadperwer li şûna wî dana. Agir nîşana serkevtina serhildanê bû. Ev rûdana giring têkelî roja 21 î meha 3 ê bû, anku rûdana felekî û serhildana Kawayî têkelî hev bûn û bû rojeka nû, (Nûroj/Newroz) û bû destpêka sersala kurdî. Ne tenê kurd, evê rûdanê sax dikin, belku gelek gel û netewe ev ê rûdanê sax dikin, ji berku nehêlana zordariyê û serkevtina azadiyê, li her derekê çê bibe û di nav çi miletekê be, dê bibe cihê dilxweşiya hemû mirov û gelên azadîxwaz. Newroz heta niho jî dibe palderekê gelek bi hêz ji bo gelê me, ku zilim û zordariya dijminan qebûl nekin, ji ber wê yekê, piraniya rûdanên giring ên gelê me di gel vê roja pîroz diên û dibine çira, meşxel û riya me ron dike.